

ELFEBEYA ZMANÊ KURDÎ

ŽI A'YÊ HETA Ž'YÊ



[Elfebe]¹

Di elfebeya kurdiya kurmancî da sî [30] tîp hee ne. Di nav van tîpan da heft [7] tîp dengdar (≈ îngl. *vowel*), du [2] tîp nîvdengdar (≈ *semivowel*) u bîst u yek [21] tîp zî dengas in (≈ *consonant*):

A a, B b, C c, Ç ç, D d, E e, Ê ê, F f, G g, H h, I i, Î î, K k, L l, M m, N n, O o, P p, Q q, R r, S s, Ş ş, T t, U u, V v, W w, X x, Y y, Z z, Ž ž

Elfebeya zmanê kurdî bi tîpa **a**'yê dest pê dike u bi ya **z**'yê zî bi dawî dibe.

Dengdar (≈ *vowel*s):

1.) **A a** [A a]: Him *drêz* u him *zî kurt e*.

2.) **E e** [E e]: Him *drêz* u him *zî kurt e*.

3.) **Ê ê** [Ê ê]: Tenê *drêz e*.

Carinan **ê** + **y** dibe *iy*, lê ev *i*'ya dengdar li vir hertim *kurt e*, wm.:

- **rê**[rê]: *riya min* [ri-y-ā mən]
- **dê**[dê]: *diya min* [di-y-ā mən]

4.) **I i** [I i]: Tenê *kurt e*.

5.) **Î î** [Î î]: Him *dirêz* u him *zî kurt e*.

Di kurdî da **î** + **y** hertim dibe *iy*, lê ev *i*'ya dengdar li vir hertim *kurt e*, wm.:

- **derî**[därî]: *deriyê min* [däri-y-ē mən]
- **kanî**[kânî]: *kaniya min* [kâni-y-ā mən]

6.) **O o** [O o]: Him *drêz* u him *zî kurt e*.

7.) **U u** [U u]: Him *drêz* u him *zî kurt e*.

¹ Elfebeya zmanê her milletî wekî çermê laşê wî milletî ye. Divêt ew çermê milletê kurd bi deqên lanet yên tirk, ereb u farsan neyê zehr kirin.

Nīvdengdar (*≈ semivowels*)

- 1.) **W w** [W w]
- 2.) **Y y** [J j]

Dudeng (*≈ diphthongs*)

- 1.) xw [x^w]
- 2.) kh [k^h]
- 3.) ph [p^h]
- 4.) čh [č^h]
- 5.) th [t^h]

Dengas (*≈ consonant*):

- 1.) **B b** [B b]
- 2.) **C c** [Ĵ ĵ]
- 3.) **Ć ć** [Č č]
- 4.) **D d** [D d]
- 5.) **F f** [F f]
- 6.) **G g** [G g]
- 7.) **H h** [H h]
- 8.) **K k** [K k]
- 9.) **L l** [L l]
- 10.) **M m** [M m]
- 11.) **N n** [N n]
- 12.) **P p** [P p]
- 13.) **Q q** [Q q]
- 14.) **R r** [R r]
- 15.) **S s** [S s]
- 16.) **Ś ś** [Š š]
- 17.) **T t** [T t]
- 18.) **V v** [V v]
- 19.) **X x** [X x]
- 20.) **Z z** [Z z]
- 21.) **Ž ž** [Ž ž]

Ligorî bêzenasiya/etîmoloziya zmanê kurdî, zmanên îranî u yê hîndî-ewrupî, dengên zmanê kurdî yê dengdar (a, e, ê, ...), nîvdengdar (w, y) u dengas (b, c, ç, ...) yekser zî zmanê bingehîn yê hîndî-ewrupî tîn, yan zî zê pêkhatinê u tenê bi ruberîhevkirina van zmanan dikare were vegotin. Her dengê sereke yê di elfebeya zmanê kurdî ya nu da, ne tenê zî dengê binyatîn, lê berevazî vê zî gelek dengên zî hev cihê yê kevinare têt.

Li hêla din dîsan dengên ku bi navbera peyvên zmanên din ketinê nav zimanê kurdî zî hee ne. Bêguman ev peyvên hanê di dengnasiya zmanê kurdî da ti bandoreke sereke ya dengîn u bingehîn nalîzin u loma zî nikarin di nav elfebeya zmanê kurdî da ciyekê xwaser bigirin.

[Tekstek]

Ez dixwazim li vir teksteke dîrokî ya ku KARL HADANK di sala 1938an da li Elmenye'yê, li bazarê Leipzig'ê, daye çapê, wekî mînak bidim. Lê ew çîrokên di vê tekstê da pêsta li ser sêlikekê hatinê tomar kirin u pasê zî ligorî elfebeya dengnasiyî u ya Celadet Bedirxan zî nu va bi du elfebeyan li ser kaxizê hatinê nivîsîn.

Ez ê li vir tenê versiyona ku min veguhartiye elfebeya li zor dayî, bidim. Di vê tekstê da axaftinek di navbera axayê êzdî Hereqol Axa u zabitê înglîz da bi saya wergêrrekî derbaz dibe. Ez li vir tenê beşeke kind zî vê axaftinê didim:

«Şeveke din – şevên zivistanê drêz in – em bi hev ra runistî bunn. Min zî wî ra got: „Hereqol Axa, kerem bike zî min ra serborî u serhatinên xwa, tiştêkî bibêze!“ Hereqol Axa got: «Ezbenî, gava ez ciwan bum, ne serekê gund u eşîr bum. Serekî [li] ser bavê min bu. Di wî wextî da di zeviyên bavê xwa da dixebitim. [Di] rozeke rozhelatê da dinya sor, zer, gewr, hêsîn, bi rengên husan xemilandî bu. Min gîsinê xwa dikir erdê u erd diqelaşt. Zî erdê [bîhna] kal u kalikên Kurdistan'ê, bîhna erdê dihat, bîhneke xwaş u ter. Min zî xwa ra got: „Hereqol! Bi xwadê roza zîna te ya delaltir, dema zîna te ya delaltir ev dem e, ku te bîhna erda te seh dikir.“»²

² HADANK 1938: 31-32.